



## Çîrokek ecêb û sosret

Ji Achim Bröger

übersetzt von Mahmut Aydin



Zilamê bi sîwan ji jinika bi bocîk pirs kir û got „Te gavek berê Rêzdar Felîx û Rêzdar Konrad dîtin?“

„EZ bawer dikim, wan silav nedane hevdu.“

Jinikê di ber xwe de kir pilepil û got,  
„Silav nedane hevdu.“



Bi şâşwazî serê xwe dihejîne û diçe, li quncikê pêş rastî mirovê qelew tê.

Ji yê qelew re dibêje, „Hela bifikire. Rêzdar Felîx û Rêzdar Konrad silavek jî nedane hevdu.

Ü wan bi mad û mirûz jî li hev nihêrîne.“

Mirovê qelew bi fişefîş dibêje „Silav nedane hev û bi mad û mirûz li hev nihêrîne.“



Pişt re pêş ve diçe, li quncikê din rastî zilamê girîng ê bi çenteyê belgeyan tê.

Silavê didê, dibêje „Roj baş, zalmê girîng ê bi çenteyê belgeyan!“

„Ma haya te ji bûyera nû heye?

Rêzdar Felîx û Rêzdar Konrad silav nedane hevdu.

	<p>Bi mad û mirûz li hev nihêrîne û bi ser de jî bi hêrs di ber hevdu re derbas bûne.</p> <p>Mirovê girîng ê bi çenteyê belgeyan dubare dike û dibêje „Silav nedane hevdu, bi mad û mirûz, bi hêrs di ber hevdu re derbas bûne.“</p>
	<p>Dû re ew diçe, li quncikê din rastî mirovekî kêfxweş tê û dibêje:</p> <p>„Rêzdar Felîx û Rêzdar Konrad min xemgîn dîkin.</p> <p>Êdî ew silavê nadin hevdu.</p> <p>Bi mad û mirûz li hev dînihêrin û kulmên xwe nîşanî hev didin.</p> <p>Û tê gotin ku yekî ji wan yê din dehf daye, bêguman ji bo ew hevdu li erdê bixin, ji ber wê ew ji hev wiha bihêrs in.</p>
	<p>Rêzdar Felîx bêguman Rêzdar Konrad xistiye xwarê, ji ber ku Rêzdar Felîx bihêztir e."</p> <p>Mêrikê kêfxweş dubare dike, dibêje, "Silav neda, bi mad û mirûz lê nihêrî, bi kulma xwe gef lê xwar û lêxist."</p>
	<p>Dûv re ew diçe, li quncikê din rastî jinika piçûk a ku şewqeyê lenger ê bi kulîlk li serê wê ye tê.</p> <p>Jê re dibêje „Silav“. „Ew ê li serê te, şewqeyek hêja ye.“</p> <p>Ka hela bifikire, Rêzdar Felîx silav nedaye Rêzdar Konradê belengaz û bi mad û mirûz lê nihêriye.</p>

	<p>Bi kulma xwe gef lê xwariye.</p> <p>Ew virvirandiye ser kolanê jî, hindik mabûye tirimbêl lê biqelibin.</p> <p>Ger Xatûn Konrad pê bihese, ew ê nîşanî Rêzdar Felîx bide."</p> <p>Silav neda, bi mad û mirûz lê nihêrî, bi kulman gef lê xwar, li erdê xist û hindik mabûku tirimbêl wî bipelixînin.</p> <p>Jinika piçûk a lengerê wê bi kulîlk got, „A xweş ew e, ku dê Xatûn Konrad alîkariya mîrê xwe bike.“</p>
	<p>Pişt re ew dimeşe û li quncikê din rastî zilamê kulek tê.</p> <p>Jê dipirse, "Tu çawa yî?"</p> <p>Ew bersivê dide û dibêje, "Ne baş."</p> <p>Jinika lenger bi kulîlk dibêje, "Bes rewşa Rêzdar Konrad xirabtir dibe."</p> <p>„Rêzdar Felîx, evê hov, silav nedaye wî, bi mad û mirûz lê nihêriye, bi kulmê lêxistiye û ew ber bi tirimpêlekê ve gêr kiriye.</p> <p>Ew niha dixuyê!</p> <p>Ew bi serê werimandî, çavê reşkirî, bi rastî xirab e.</p>
	<p>Xweşbextane Xatûn Konrad bi hêz e û ew ê di demeke nêzîk de hesabê vê yekê ji Rêzdar Felîx bipirse.</p> <p>Min gavek berê ew li dikanê dît.</p> <p>Wê gelek qutîkên konserveyê kirîn."</p> <p>"Silav nekir, bi mad û mirûz lê nihêrî, bi kulman li çavên wî xist, bi pehînan li gîтика wî, hestiyê çîpa wî xist.</p>

	<p>Zilamê kulek dibêje, "Ji ber vê sedemê, dê Xatûn Konrad Rêzdar Felîx bifelşîne," û dikule diçe, li quncikê din rastî zilamê keçel tê.</p> <p>Ji wî dipirse. "Te bihîst?"</p> <p>"Feliks, ewê rezîl, silav nedaye Rêzdar Konradê belengaz bi mad û mirûz lê nihêriye, kulmek li çavê wî xistiye, li çengê wî xistiye û ew avêtiye ser kuçeyê û hindik mabûye ew gêrî binê tirimpêlekê bibe.</p> <p>Wermên mezin, çavê reşbûyî, her tişt bi rastî xirab e.</p>
	<p>Lê paşê jina bihêz Xatûn Konrad hatiye.</p> <p>Wê nîşanî birêz Felîx daye.</p> <p>Çêr kiriye, pê li pêçiyêن wî kiriye, qutiyek konserveya fasûliyan avêtiye serê wî.</p> <p>Ü zarokên Konrad jî li wir bûne.</p> <p>Zarokên Felîx û jina Felîx ji wir bazdane.</p> <p>Pevçûnek mezin! Polîs û ambûlans hatine, agirkuj jî li wir bûye û her tişt şil kiriye.</p>
	<p>Dûv re mîrikê keçel dûbare dike û dibêje:</p> <p>"Silav nedaye, bi mad û mirûz lê nihêriye, kulmek li çavê wî xistiye, bi pehînan li hestiyê çîpa wî xistiye, ew gêrî binê tirimpêlê kiriye.</p> <p>Seriye werimandî, çavê reş.</p> <p>Pevçûnek bi dilê te mezin a malbatan bi polîs û ambûlans.</p> <p>Baş bû ku ekîba agirkujiyê hat û êdî her kes şil e."</p> <p>Zilamê keçel dike pilepil:</p> <p>"Ji ber vê porê mirovan gjî dibe."</p>



Paşê ew diçe, li quncikê din Rêzdar Konradê belengaz dibîne.

Ev mirovê qelew û keçel ji Konradê belengaz re dibêje, "Ooooff... Ez pir xemgîn bûm.

Tu çawa yî?

„Pir baş e, lê mixabin dema min tune.

Ez û hevalê xwe, birêz Felîx, em ê bêñ navbereke.

Em dixwazin bi hev re bîreyekê vexwin."



Mêrikê keçel diheyîre, dibêje, "Ez fêhm nakim."

„Rêzdar Konrad nakule, ne şil e.

Mîna ku tiştek bi wî nehatibe xuya dike û tevdigere.

Ew careke din şaşwaz dibe û dibêje, "Ez bi rastî fêm nakim."



**Dawî**